Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1130 31-Berfanbar- 2023 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Berhemên xwemalî ji bo tenduristiya mirovan dermanin



Tevî hebûna bi dehan berhemên navxweyî, lê bazarên Herêma Kurdistanê ji berhemên ku ji Tirkiye û Îranê tên hinartin tijî bûne. Ji ber van berhaman bi dehan nexweşiyên kronîk bi welatiyan re derketiye. Cotkar Mihemed Ehmed got: “Berhemên xwemalî, xwezayî û bi tenduristin.”

Demsala payîzê ye û salane bi dehan festîval ji bo danasîna berhemên herêmî û kurdî tên lidarxistin. Lêbelê, tevî kêmbûna girîngiya hikûmeta kevnar ji bo berhemên navxweyî û nebûna alîkariya cotkaran, lê belê wan herêm veguherandine bazara firotina berhemên welatên din ku bûne sedema çavkaniya bi dehan nexweşiyên kronîk.

Cotkarê hilberînerê berhemên xwemalî Mihemed Ehmed derbarê cudahiya berhemên xwemalî û berhemên derve ji ajansa me re axivî û got; “Di warê sûd û tenduristiyê de ferqek mezin di navbera berhemên navxweyî û yên hawirdekirî de heye. Yên ku tên hawirdekirin dema wan bi ser ve çûye an jî madeyên parastinê di nav de hene ku gelek bi zererin. Lê belê, berhemên xwemalî li zeviyên bikêr û avên paqij tên gihandin.”

Mihemed diyar kir ku berhemên Kurdî di warê tenduristiyê de bikêr û dermanin, birincê xwemalî yê Kurdî eger ji bo salekê bê embarkirin, kurm dikeveyê û wiha dewam kir; “Lê ji bo demekê dirêj kurm nakeve birînc û hemû berhemên hawirdekirî. Ji ber ku bi madeyên zererdar têne parastin, dibin sedema nexweşiyên kronîk ev berhemane têne parastin ji ber vê yekê hemû êş û nexweşiyên ku derketine ji ber van xwarinên hawirdekirî ne.”

Di berdewamiya axaftina xwe de Mihemed diyar kir ku festîval ji bo bêtir nasîna berhemên navxweyî tên lidarxistin û got; “Diviyabû Hikûmeta Herêma Kurdistanê berhemên xwemalî pêş bixista û alîkariya cotkaran bikira, ne ku berevajiyê vê yekê berhemên xirab ji welatên din derbazî Herêma Kurdistanê bike. Berhemên xwemalî yên ku niha li bazarên Herêmê peyda dibin li gorî demsala gihandinê ji birinc bigire heta her cûre sebze, berhemên şîr û bi dehan berhemên din pêk tên.”

Herwiha kiryarê berhemên xwemalî Îsmaîl Omer derbarê kalîte û sûdê berhemên xwemalî de got ku; “Berhemên me ji yên ji Tirkiye û Îranê tên gelek cuda ne, madeyên parastinê têde nînin û em xwediyên wan nas dikin. Ew ne wekî berhemek ji welatên din tê û em awayê çêkirinê an paqijiyê nizanin.”

Herwiha Îsmaîl Omer got; “Berhemên hawirdekirî ji bo erzankirina wan gelek hîle têne kirin. An jî qediyaye û têxin nav kartonên nû û têne hinardekirin. Sedema anîna van berheman ji bo berjewendiya çend kesane. Lê bi hezaran kes bikar tînin û nexweş dikevin.Hikûmet ji bo berjewendiyên xwe bazirganiyê dike, ne ji bo berjewendiyên gel.”

Cotkarekê din ku berhemên xwemalî hildibirîne Şiwan Adil jî di derbarê mijarê de nêrînên xwe anîn ziman û got; “Berhemên xwemalî madeyên kîmyayî yên parastinê têde nînin. Xwarina wan saxleme, madeyên ku zererê didin bedenê di nav de nîne. Nexweşxane hemû tijî nexweşin, hemû ji ber berhemên hawirdekirî yên ji Tirkiye û Îranê ne, ji ber ku kalîteya wan nebaşe.”

Li gorî daneyan, qebareya hinardekirina xurek ji Tirkiyê bo Herêma Kurdistanê salane 10 milyar dolar û 6 milyar dolar ji Îranê tê pêşbînîkirin. Ev pere ji Herêma Kurdistanê diçe derve. Ev jî li gel wê yekê ye ku hikûmet tu giringiyê nade sektora çandiniyê û hilberîna navxweyî.

# Sala 2023’an wê bibe ‘sala herî germ a heta niha hatiye qeydkirin’

Servîsa avhewayê ya Ewropayê Copernîcûs ragihand ku piştî meha Mijdarê ya ‘awarte’ sala 2023’an wê bibe sala herî germ a hatiye qeydkirin.

Meha derbasbûyî bû meha şeşemîn ku rekora germahiyê li ser hev hate şikandin. Bi germahiya derdora 14.22 pileyî ya germahiya global re meha Mijdarê ya 2023’an li gorî Mijdara 2020’î ya rekora germê hatibû şikandin, bi 0.32 pileyî zêdetir germ bû. Ev meh li gorî Mijdara dema 1850 û 1900’î ya serdema beriya pîşesaziyê bi 1.75 pileyî hîn germtir bû.

Li bakurê cîhanê payîza ku ji Îlonê heta Mijdarê dewam dike, bi 15.30 pileyî bû payîza herî germ a dîrokê.

Alîkara Serokê Servîsa Guherîna Avhewayê ya Copernîcûsê (C3S) Samantha Bûrgess got, “Di sala 2023’an de êdî şeş meh û du demsal hene ku rekor şikandine. Meha Mijdarê ya awarte ku 2 rojên wê bi 2 pileyî di ser rêjeya germahiya beriya pîşesaziyê bû, sala 2023’an kir sala herî germ a hatiye qeydkirin.”

Dîrektorê C3S Carlo Bûontempo jî got, “Heta ku konsantrasyona gaza serayê zêde bibe, em nikarin li benda encameke cuda bin. Germahî wê zêde bibe, pêla hewa germ û ziwatiya wê hîn bêhtir bi bandor be.”



## Sudoku: Bersiv 41

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 7 | 9 | 8 | 1 | 4 | 5 | 2 | 3 |
| 4 | 5 | 8 | 9 | 3 | 2 | 6 | 1 | 7 |
| 3 | 2 | 1 | 5 | 6 | 7 | 4 | 9 | 8 |
| 2 | 1 | 6 | 7 | 5 | 9 | 3 | 8 | 4 |
| 8 | 3 | 7 | 2 | 4 | 1 | 9 | 5 | 6 |
| 5 | 9 | 4 | 6 | 8 | 3 | 2 | 7 | 1 |
| 7 | 4 | 3 | 1 | 2 | 5 | 8 | 6 | 9 |
| 9 | 6 | 2 | 3 | 7 | 8 | 1 | 4 | 5 |
| 1 | 8 | 5 | 4 | 9 | 6 | 7 | 3 | 2 |

## Sudoku:Pirs 42

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | | | | 7 | 1 | | | |
| 3 | | | | | 4 | | | 9 |
| | 7 | | 6 | | | | | |
| | 1 | | | | 5 | 3 | 8 | 6 |
| 5 | | 9 | | 8 | | 4 | | 2 |
| 8 | 2 | 6 | 4 | | | | 5 | |
| | | | | | 9 | | 2 | |
| 4 | | | 5 | | | | | 1 |
| | | | 3 | 2 | | | | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Hesinê wî ne ti hesin e:**
- Ne mirovekî baş e; beredayî ye; ne yê baweriyê ye.

**Pêş û paşên wî ne diyar in:**
- Çi tê ber devê wî dibêje; bê ku bihizire diaxive; bê ku gotinên xwe bipîve diaxive.

**Li pêş û paş nanêre:**
- Bi heman wateyê.

**Li pêşiya xwe nanêre:**
- Bi heman wateyê.

**Li ber zimanê xwe nanêre:**
- Bi heman wateyê.

**Ne li pêş dide ne li paş:**
- Bi heman wateyê.

**Ne ceng e ne reng e:**
- Mirovekî beredayî ye; bi kêrî tiştekî nayê.

**Pêşî lê berdaye:**
- Serbest kiriye; baş perwerde nekiriye; serberedayî mezin kiriye.

**LI SER BAWERÎ Û JIXWEBAWERIYÊ**

**Aqilê min jê dikeve/aqilê min jê dibire:**
- Dikare bike; baweriya min pê tê.

Cihê hêvî jê tên kirin gazind jî jê **tên kirin:**
- Baweriya me pê heye ji ber wê em gazindan jê dikin.

**Çavê mirov tijî dike/dadigire:**
- Biserûber e; birêkûpêk e; hêviyê dide mirov; baweriyê dide mirov.

**Çavên wî li şûn ve neman:**
- Bawerî jê re çêbû.

**Çavên wî li paş neman:**
- Bi heman wateyê.

**Destê xwe li singa xwe da:**
- Xwe jêhatî nîşan da.

**Di serê min de rûnişt:**
- Baş bi serê min ket; baweriya min pê hat.

**Ez jê piştrast im:**
- Ez pê bawer im.

**Ez jê biavneh im:**
- Ez pê bawer im.

**Ez di çavê xwe re kirim:**
- Ez kirim amanc; bawer kir ku ezê alîkariyê bidimê.

**Girtî ye:**
- Yê baweriyê ye; gotinan nagerîne; gotin xwe pê re digirin; tiştên bi dizî eşkere nake.

Lingê xwe li lingê wî dixe.
- Dikare pêşbaziyê pê re bike; baweriya wî pê tê.

**Nanê me bixwe da tu tiştên me nedizî:**
- Da baweriya me bi te were. (Ev biwêj bi giranî di nava Êzîdiyan de tê gotin)

**Pişta min jê rast e:**
- Tiştên nebaş nake; baweriya min pê heye.

**Pişt pê girê daye:**
- Hêza xwe ji wî distîne; baweriya xwe pê aniye.

**Pişta xwe jê re vekir:**
- Xefên xwe jê re gotin; baweriya xwe pê anî.

**Pişta xwe dayê:**
- Baweriya xwe pê anî.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Pêngava azadiya Abdullah Ocalan



Bi druşmeya “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî ” ku di 10’ê Cotmehê de hatiya destpêkirin û li seranserî cîhanê belav bû ye. Bi deh hezaran kes tevlî vê kampaniyê bûn da ku bighêje armanca xwe. Pêngav xwedî giringiyeke taybete ku li cîhanê tev belavbûye û dostên gelê Kurd roj bi roj tevlîbûna wan ji kampaniyayê re zêdedibe.**R-5**

## Di 2023’an de Jinan di qada aborî de roleke girîng lîstin



Bi Şoreşa Rojava re jin careke din bûne xwedî statuyeke aborî û afrînerên jiyanê. Berdevke Aboriya Jin Gulê Murad diyar kir ku di sala 2023’an de têkoşîna jinê di hemû qadan de berdewam kir û bi taybet di qada aborî de roleke girîng lîst.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1130 31-Berfanbar- 2023 www.ronahi.net/ku/

# SALEKE TIJÎ ÊRIŞ Û BERXWEDANÎ

Bi armanca şikandina vîna gelên herêmê û têkbirina destkeftiyên heyî, êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li dijî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di sala 2023’an de bê navber dewam kir. Dagirkeriyê di êrişên xwe de binesaziya herêmê û welatî kirin hedef. Di encamê de jî bi 10’an welatî şehîd û birîndar bûn û binesaziya herêmê ziyaneke mezin dît. Li hemberî êrişên dagirkeriyê jî her ku çû berxwedana gelên herêmê û xwedîderketina wan li destkeftiyên şoreşa 19’ê Tîrmehê bi hêztir bû.**R-3**












# ‘Em ê her derê veguherînin qada berxwedanê’

Çalakiya gireva birçîbûnê ku girtiyên azadiyê yên di girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê de di çarçoveya pêngava cîhanî ya bi dirûşmeya “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî” dane destpêkirin, di roja 35’an de didome. Berxwedêrên zindanan bang gelê kurd kirin ku her derê vegherînin qada berxwedanê.**R-5**



Rojeva azadiyê nayê guhertin — Zozan Cizîrî R-2


Silav li sala 2024’an — Ahmet Aktaş R-4


Êriş nîşaneya serketina paradîgmaya şoreşê ye — Idrîs Henan R-5


Xêr û Şer — Sîpan Şînda R-7

## Desteya Jîngehê parêzvana jîngeh û xwezayê ye



Hevserokê Desteya Jîngehî ya Rêveberiya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ibirahîm El-Esed diyar kir ku Desteya Jîngehî di 29’ê Gulana 2023’an de bi rengekî fermî bi biryara Rêveberiya Xweser di Meclisa Qanûnsaz de, hat ragihandin, da ku gavine mezintir di aliyê parastina jîngehî de bên avêtin.**R-6**

## Wêjeya şoreşê...(1)



Edebiyat, wêje an jî lîteratûr sê peyvên hemwate ne. Peyva edebiyatê bi Erebî ye, ya „wêje“ bi Kurdî ye, ya „lîteratûr“ jî bi Latînî ye. Edebiyat ji peyva „edeb“ê tê û wateya vê ya ferhengî „zerafet, nazikî û xweşikî“ye. Ereb bi xwe di wateya peyva edebiyatê de mîna disîplîn peyva edebê bikar tînin.**R-7**

# Di 2023’an de Jinan di qada aborî de roleke girîng lîstin

Bi Şoreşa Rojava re jin careke din bûne xwedî statuyeke aborî û afrînerên jiyanê. Berdevke Aboriya Jin Gulê Murad diyar kir ku di sala 2023’an de têkoşîna jinê di hemû qadan de berdewam kir û bi taybet di qada aborî de roleke girîng lîst.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Li bakur û rojhilatê Sûriyeyê jinên ku şoreşa xwe lidar xistin û di hemû qadan de pêşengiyê dikin, di bin sîwana Kongra Star de ji bo civakek exlaqî û polîtîk jî xwedî xebatên giranbuha ne. Yek ji wan xebatan jî xebatên aborî ye. Kongra Star ji bo ku aboriyeke komînal di nava civakê de biafirîne di sala 2015’an de xwe bi rexistin kir. Ji sala 2015’an heta 2023’yan gelek plan û projeyan bi peş xist.



Derbarê kar û xebatên Aboriya Jin yên salekê, berdevka Aboriya Jin a bakur û rojhilatê Suriyê Gulê Murad ji rojnemeya me re axivî.

Gulê Murad di destpêka axaftina xwe de bal kişand li ser avabûna beşa aboriya jin û girîngiya wê û wiha got: “Kongra Star di bin sîwana şoreşa jinan de xwedî li tevahî ferdên civakê derdikeve. Wek aborî jî beşekî girîng digre dest, di heman demê de aboriya civakê bi destên jinan tê afirandin, ji ber ve jî jin ji bo ku xwedî li keda xwe derkevin me beşa xwe di sala 2015’an de di bin sîwana Kongra Star de birexistin kir. Ji sala 2015’an heta sala 2023’yan bi pêşengiya jinan li bakur û rojhilatê Sûriyeyê gelek projeyên girîng hatin avakirin. Her wiha me girîngiyeke mezin da projeyên koperatîfan, ji ber ku kopertîf karên hevbeş ên civakê ne. Di destpêka kar û xebatên me yê aborî de, me bi çandiniyê dest pê kir û bi berhemên wê me dest bi projeyan kir. Her wiha pirojeeyên me cur bi cur in, hin ji wan biçûkin hin ji wan jî mezinin lê piraniya xwe koparatîfin ji berk û di koparatîfan her kes cihê xwe tê de digre e.”

**Koperatîf**

Gulê bal kişand li ser giringiya koparatîfan ji mirov û civakê re û wiha got: “Civakên komînal an jî wek ku tê zanîn koperatîf roleke sereke di pêşxistina aboriyê de heye, ji ber ku ew ruhê civaka hevkar û yekkirina têkiliyên civakî yên ku ji ber rejîmên serdest hatine qutkirin derdixe pêş. Bi van komeleyên koperatîfan derfetên nû yên jiyanê, bi hêzkirinê hatin dîtin. Rola jinê di warê aborî de û xweparastina wê bêyî ku alîkariyê ji kesî bixwaze, ji bilî xurtkirinê. Têkiliyên jinan di civakê de. Lewma di projeyên xwe de bi giranî xwe dispêrin komeleyên çandinî, pêşesazî, dirûtxane, her wiha pirojeyên me yên firinên nan jî hene. Li her herêmekî li gorî pêwîstiyan em pirojeyan pêk tînin, di heman demê de bingiha koparatîfan komîn in,di riya komînan re em sardana malan dikin û rewşa her malbatekî jî em nas dikin, bi taybet malbatên şehîdan di xêza yekem de ne. Ji bo jin û dayikê şehîdan derfetên kar peyde dikin. Ji bilî va pirojeyan jî, perwerde û civîn ji bo jinan tên çêkirin. Di nav hemû koperatîfan de hejmara jinên ku cihê xwe digirin, digihêje 2 hezar jinan. Dema ku em ji bo avakirina komeleyeke nû lez dikin, di destpêkê de di nava komînan de civînan li dar dixin, pergala koperatîfan û girîngiya wê didin nasîn û li nêrînên gel guhdarî dikin. Pêwîstiyên komînê û her projeyek ku li gorî wê komînê be, her komeleyek meclîsa xwe heye, meclîs ji 5 endaman pêk tê û her endamek li gorî karê xwe tevdiger e û tensiq di navbera me û komîteya giştî de heye.”

**Piroje**

Gulê di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser projeyên çandiniyê û wiha got: “Di serdema neolîtîkê de jinan çandinî dikirin û ji hev re gelek giya û sebze keşf dikirin. Beşeke mezin û girîng a projeyên me yên çandiniyê ye û em xwedî gelek cihan in. Projeya me ya xwedîkirina dewaran li TirbeSabiyê ya kantona Qamişlo ye. Projeyek me heye ku nêzî 1000 dewarî hene. Her wiha Komîteya Aboriya Jin li bakur û rojhilatê Sûriyê, 9 nanpêjên me hene. Projeyek ji bo nanê sêlê û nanê tenûrê jî heye. Ji bilî van projeyên biçûk û kooperatîfan, projeyên me yên mezin ên wekî kargehan jî hene. Li kantona Şehbayê li bajarê Dêra Zorê kargeha ava paqij û kargeha turikan, her wiha çend dikanên me yên xwarinê hene, xwaringehek li Sêmalka ya ser bi bajarê Dêrikê jî heye. Şîrîngeha Lara li navçeya Amûdê jî heye. Di heman demê de hijmarek baş ji daran li Reqa, Tebqa, Minbic nêzî 7 hezar darê zeytûna hene. Me dixwest ku hijmara daran li herêma Cizîrê zêde bikin û nêzî 4 hezar darên fêkî hatin çandin. Çandinî par û rûbera herî mezin di aboriya jinan de digre, ji ber ku rûbera zevî digihêje 45 hezar donim, em li wan erdan gelek diçînin, cureyên ku têne çandin genim, ceh, nok, nîsk û hwd…, em her cure sebzeyan diçînin da ku pêdiviyên gel peyda bikin, ji bo lîsteya projeyên jin, projeya Jiyan ku beriya 2 salan li Dêrikê hat avakirin, projeya Demsal li bajarê Tirbesabiyê beriya 8 salan hat avakirin, pirojeya Digurê beriya salekê hat avakirin, projeya Şefqa û Xezna ya sebzeyan. Herwiha projeya bendavê li bajarê Hesekê û gelek komele li Şehba, Kobanî û herêmên rizgarkirî hatine avakirin.”

**‘Feydeya herî mezin ji bo jinê ew bi xwe ye’**

Gulê Murad wiha axaftina xwe berdewam kir û got: “Dibe ku li hinek cihan em ne xwediyê komeleyên koperatîfan bin, lê li herêma ku ji aliyê vê sîstem û pêkhateyê ve tê birêvebirin di nava civakê de roleke girîng dilîze, wek nimûne, lê ne bi tenê, berhemên van civak û koperatîfan bi lez û bez di nav civakê û bazaran de bi bihayekî ji nirxê bazarê kêmtir, dûrî yekdestdarî û îstîsmarê belav bibin û ji hemû aliyan ve zextan kêm dikin, ji ber ku gel bi van berheman ve girêdayî ye. Bêyî ku hewcedariya bajar û bazaran be. Her wiha Me giranî daye koparatîfan ji bo ku civaka me mezinbibe û bibe xwedî komînaliyek ji aliyê mirovan ve û kapîtalîzima di civakê de ji holê rabe. Her wiha ku feydeya herî mezin ji bo jinê, jin bi xwe ye, ji ber ku ew xwediya van berheman e û aboriyê bi rê ve dibe, mal bi rê ve dibe û zarokên xwe mezin dike. Gelek jinên ku di nava komeleyan de xebitîn û xwe pêş xistin, berê xwe dan projeyên din û dest bi meşandina proje û komeleyan di nava aboriya jin de kirin.”

Berdevka Aboriya Jin a bakur û rojhilatê Suriyê Gulê Murad di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Armanc ne tenê qazanc û firotin e. Em pêdiviyên civaka xwe ji sebze û fêkiyan peyda dikin, herwiha jîngeh û tenduristiyê jî diparêzin. Ji ber vê yekê em hewl didin van pirsgirêkan çareser bikin. Bi berdewamiya têkoşîna jin di hemû qadan de, bi taybet di qada aborî de, jin cihê xwe yê bingehîn digre. Divê ku jin timî îradeya xwe xurt bike û li hemberî her tiştî bisekinin.”

## Ramangeh

### Rojeva azadiyê nayê guhertin

Zozan Cizîrî

Dewleta Tirk a dagirker a li hemberî çalakiyên serkeftî yên gerîlayên azadiya Kurdistanê derbên giran xwarî, ji bo nehêle taybet gelê Kurd bi vê serkeftina keç û xortên xwe yên leheng kêfxweş bibe, wekî her car vê carê jî berê xwe da xelkên sivîl ên Rojavayê Kurdistanê. Lewre bi rojane bêy ku bibêje ev jin e, zarok e, ciwan e, extiyar e êrîşî her dever û kargeheke medenî dike. Di van êrîşên dewleta Tirk a dagirker û xwînmij de gelek însanên me yên welatparêz û kedkar şehîd bûn, gelek kes jî birîndar bûn. Şehadet û birîndariya her însanekê/î bêguman her keseke/î xwedî şeref û keramet ji dil diêşîne. Li cihê ku xwîn biherike, mirov nikare li hemberî hêsrên dayîk û bavan, xuşk, bira û zarokan bêxem bimîne. Encex xusûsek heye ku, vê êş û xemê difetilîne wateyê û nirxê wê bilind dike; ew jî Felsefeya Jiyana Azad û Birûmet a Rêber APO ye ku, doza mafdar a azadiya gelên bindest nûjen kiriye. Taybet gelên Rojavayê Kurdistanê bi dehan sal in bi hesreta azadî û demokrasiyê dijîn. Ji bo vê Şoreşa 19’ê Tîrmehê sala 2012’ê bi girseyî û kêfxweşî lidar xistin. Îro vê pêla şoreşê hêz û zanebûnek mezin di nava gel de pêş xistiye. Rastiyeke jiyanê heye ku, her însanek dema tê dunyayê, li dawiya xwe mirin heye. Di vir de ya girîng, şêwazê mirinê ye. Însan heye di nav wextê jêre hatî veqetandin de bi tirsonekî jiyana xwe didomîne, taliyê di nav lihêfên germ û nerm de bi sernizmî çavên xwe li jiyanê digire. Însan heye jî tenê ji bo mal û mulk kom bike bêhesab dixebite, lê dawiyê çavbirçî û bê sermaye ji vê cîhanê koç dike. Wekî van gelek rengên jiyana însan hene ku, ew ji mirov re dibe nav-nîşan û sermaye. Lê kesên di mekanê şoreşê de li ser karên civakî, hem jî di encama topbaran û êrîşên zalim û zilmkaran de jiyana xwe ji dest didin, ew dibin nirxên nemir ên civaka xwe, dibin rûmet û serfiraziya gelê xwe. Van şehadetan îro mekanê şoreşê Rojavayê Kurdistanê pîroztir kirin. Ji bo wê rast e, wek gel êş û xemên me pir in, lê hêrs û biryara xwedî derketina li vî mekanê bi xwîna hezaran şehîdan pîroz bûyî, mezintir bûye. Li ser vê bingehê şehadeta Rîhanan, Yûsrayan, Şervînan, Bêrîvanan di nava sala 2023’yan de doza azadiya jin bêhtir kemilandin, rojeva azadiya civakê xurtir kirin.

Di vê wateyê de êrîşên dewleta Tirk a dagirker û xwînxwar li ser gelên Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên bi felsefeya jiyana azad û demokratîk şiyar bûyîn, encama armanc kirî qet nagire, berevajî van êrîşan bêhtir eşkere kir ku, dewleta zalim û qirker çiqas sefîl û rezîl e. Bi van êrîşan dunya-alem zanî ka vê dewleta dagirker çiqas derbek giran ji destê keç û xortên leheng ên gerîlayên azadiya Kurdistanê jî xwariye. Lewre hezar silav ji bo wan dest û tiliyên di nav berf û seqema çilê zivistanê de li hemberî dagirker û xwînmijên welatê me pêl tetikê dikin, dîwarê tirs û bêçaretiyê hildiweşînin û hêviya azadiya gelan mezintir dikin!

# Jina Kurd a rewşenbîr û şoreşger: Exterî Reşol

Îro 67 sal bi ser şehîdbûna jina şoreşger Exterî Reşol re derbaz dibe. Di rojekê weke îro de yek ji jinên çalak û şoreşgerên bajarê Silêmaniyê, Exter Reşol di dema xwepêşandana û pêşwazîkirina cenazeyê Şêx Mehmûd Berzencî de li ber Saraya Silêmaniyê di êrîşa polîsan de şehîd bû.

Di dîroka Gelê Kurd de, bi sedan jinên şoreşger mohra xwe li dîrokê dane. Jinên şoreşger di hişyarkirin û pêşxistina civakê de xwedî roleke bi bandor bûn. Yek ji wan jinan jî Exterî Reşole.

**Exterî Reşol kiye?**

Îro 67’e mîn salvegera şahadeta Exterî Reşole. Ew yek ji çalakvan û şoreşgerên bajarê Silêmaniyê bû ku di dema pêşwazîkirina cenazeyê Şêx Mehmûd Hefîd de di rêzên pêş de cihê xwe girt. Lê wê demê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatin gulebaran kirin û Exterî Reşol di gulebaranê de şehîd bû. Exterî Reşol di sala 1929’an de li Silêmaniyê ji dayîk bû ye û keça Salih e. Hevjîna stranbêjê Silêmaniyê yê naskirî Reşol Ebdullah bû. Zarokên wan nebû. Yek ji jinên Silêmaniyê ya xwedî paye û çalakvanek Silêmaniyê bû. Exterî û Reşol hevrêyên binemala Şêx Mehmûd Hefîd û Hepsexan Neqîb bû. Di navbera wan de hatin û çûn hebû. Exterî timî li pey azadiyê bû û li qada siyaset û şoreşgerî de xebat dikir. Weke jinek şoreşger ji xebatê qut nebûye û timî tevlî çalakiyên wê demê dibû.

Exterî xwendewar bû û yek ji jinên bihêz a Silêmaniyê bû. Xwedî cihetî taybet a civakî bû. Ji ber vê yekê hevrê û dostê Hepsaxan Heqîb û Zekiye Baban bû. Di çareserkirina pirsgirêkên wê demê yên civakî de roleke berçav hebû.

Di 9’ê Cotmeha 1956’an de Şêx Mehmûd Hefîd ji ber nexweşiyê koça dawî kir. Cenazeyê wî vegerandin bajarê Silêmaniyê. Di 11’ê Cotmeha 1956’an de li ber Saraya Silêmaniyê di dema pêşwazîkirina cenazeyê wî de, kesên cenazeyê Şêx Mehmûd pêşwazî dikirin û raperîna xelkê têkel bû. Ji ber vê yekê di navbera xelk û polîsan de alozî çêbû. Lewma polîs xwepêşanderan gulebaran dike. Di encamê de Exterî Reşol li ber Saraya Silêmaniyê di temenê 27 salî de şehîd bû. Ji ber gulebaranê kesek din jî şehîd bû û nêzî 50 kesan jî birîndar bûn.



Her çiqas di pirtûk û bîranînan de li ser Exterî gelek agahî nînin, lê ji bo bîranîna wê û zindîhiştina navê vê jina şoreşger ji aliyê peykersaz Çêner Nizar ve peykerek jî hate çêkirin. Li ber deriyê Saraya Silêmaniyê û cihê lê şehîd bûyî hatiye danîn. Di roja 24’ê Tîrmeha 2019’an de perde li ser peyker hate rakirin.

Çavkanî: Pirtûka ‘Jinên Navdar ên Kurd’ ya mamosteyê fakûlteya dîrok û zanistên mirovî ya zanîngeha Silêmanî Ebdulixalid Sabîr.



# Ji Dara Zanistê Şaxek: Dîroka Hunerê Rêbazên Dahûrîna (analîz)

**Berhemên Hunerî**

Rêya herî rast a têgihîştina hebûna diyardeya (olgû) hunerê di dahûrandina berhema hunerî de veşartiye. Li ser vê mijarê di serê sedsala 20an de baldarî dest pê kiriye û di 1915an de bi Heinrich Wolfflin, piştre jî bi Erwin Panofsky pêşketiye û berdewam kiriye.

Li ser vê mijarê armanc û xebatên herdu dîroknasên hunerê di bingeha xwe de li ser dahûrandina berhemên ku bi şêweya Ronesans û Barokê hatine afirandin meşiyaye. Di çarçoveya vê nêzîkbûnê de, di dahûrandina berhemên Ronesansê de, bi navê;

a- Rêbaza dahûrîna şêweyê,
b– Rêbaza dahûrîna îkonografîk,
c– Rêbaza dahûrîna îkonolojîk,
sê rêbazên dahûrandinê bingeh girtine.




**Rêbaza Dahûrîna Şêweyê:**

Di serê sedsala 20an de Wolf-flin, li ser lêkolîna formê xebatan kiriye. Li ser dahûrandina berhemên Ronesans û Barokê pênc rêgezên bingehîn derxistiye holê. Van rêgezan di sala 1915an de di pirtûka xwe yê bi navê ‘’Têgihên Bingehîn Yên Dîroka Hunerê’’ de berhev kiriye. Ev rêgezên bingehîn di lêkolîna berhemên ku di sedsalên 16an û 18an de hatine afirandin, hatiye bikaranîn. Ji van rêgezan yek ji bo taybetiyên berhemên Barokê, yek jî ji bo taybetiyên berhemên Ronesansê hatiye bikaranîn. Wolfflin dibêje ku ev rêgez ji bo lêkolînkirina berheman têr dike, lê piştre Panofsky rêbazên îkonografîk û îkonolojîk ji bo dahûrandinê pêşniyar dike û tê fêmkirin ku rêgezên Wolfflin ji bo şîrove û fêmkirina berheman têr nake. Çimkî di berhemên hunermendên ku li gor şêweya Ronesans û Barokê berhem dane de, hin caran li derveyî şêweya gelemperî jî berhem hatine dayîn û ev rastiyek berbiçav e. Ji ber vê sedemê jî rêgezên Wolfflin ji bo dahûrandinê tenê têrê nake û kêm dimîne. Hin berhem van rêgezan bi temamî nîşan didin, hin berhem jî çend rêgezan li gor heyama xwe nîşan didin. Ji ber vê sedemê jî rêgezên Wolfflin, bixêzîbisîhî; rastek-kûrayî; forma girtî-forma vekirî; piranî-yekîtî û berçavî-nediyarî ji bo berhemên Ronesans û Barokê bi tevahî nayê bikaranîn. Her çi qas rêgezên Wolfflin ji bo berhemên nûjen neyê bikaranîn jî, divê berhemên nûjen jî ji aliyê şêweyê ve bên dahûrandin.

**Rêbaza Dahûrîna Îkonografîk:**

Îkonografî şaxekê dîroka hunerê ye ku li ser mijar û wateyên berhemên hunerî disekine. Ji ber vê sedemê jî di rêbaza dahûrîna îkonografîk de çîrok û alegorî tê tespît kirin, di navbera mijar û têgihan de pêwendî tê danîn û nîgaşên (îmge) berhemê tên dahûrandin. Rêbaza dahûrîna îkonografîk, ji hêla Panofsky ve ji bo dahûrandina berhemên Ronesans û Barokê hatiye bikaranîn, lê ev rêbaz ji bo dahûrandina berhemên heyamên cuda jî hatiye bikaranîn. Di vê rêbazê de wek mînak, di dema Bîzansiyan de mijarên ku bi teknîka mozaîk û freskoyê li dîwarên dêran hatiye neqişandin, di navbera van mijaran û Încîlê de pêwendî tê danîn û dahûrandina wan ê îkonografîk tê kirin.

Rêbaza Dahûrîna Îkonolojîk:

Di vê rêbazê de armanc, heyama ku berhem tê de hatiye afirandin, nirxên çandî, kesayetiya hunermend û rewşa çandê li ser berhemê çawa bandor kiriye tê dahûrandin. Bi vê rêbazê, ango bi dahûrandina îkonolojîk, em çanda heyama ku berhemê afirandiye, dîtina wê ya dinyayê û kesayetiya hunermend fêr dibin û berhem wek belgeyek argumanan dide me. Çawa ku di bin bandora felsefeya Skolastîk de, di heyama Ortaçaxê de ev dîtin bandor li berhemên wê demê kiriye, wisa jî di berhemên Ronesansê de jî felsefeya mirovhezî (humanîzm) derdikeve pêş. Ev rewş di pêvajoyên nûjen de jî derbas dibe.

**Nûhat Deştî**

# Wêjeya şoreşê...(1)

**Berhemên Hunerî**

Edebiyat, wêje an jî lîteratûr sê peyvên hemwate ne. Peyva edebiyatê bi Erebî ye, ya „wêje“ bi Kurdî ye, ya „lîteratûr“ jî bi Latînî ye. Edebiyat ji peyva „edeb“ê tê û wateya vê ya ferhengî „zerafet, nazikî û xweşikî“ye. Ereb bi xwe di wateya peyva edebiyatê de mîna disîplîn peyva edebê bikar tînin. Wekî ku dibêjin „el-edeb’ul Kurdî, ango edebiyata Kurdî. Pirhijmara peyva edebê edebiyat e û ji aliyê Kurd, Faris û Tirkan ve tê bikaranîn. Wekî „Edebiyata Kurdî“, „Edebiyatî Farisî“ û „Türk Edebiyatı“. Wêje ji peyva „wutin“ê tê. „Wutin“ di Kurdiya Soranî, Goranî û Zazakî de bi fonetikek nêzî hev beramberî wateya peyva „gotin“ê tê bikaranîn. Peyva lîteratûr di hemû zimanên ewrûpî de bi wateya edebiyatê ye.

Cûre bi cûre bê tarîfkirin jî, wêje ji berhemên nivîskî û devkî re tê gotin û ew jî bi ziman re zexm girêdayi ye. Wêje hêza xwe bikaranîna ziman digire û bi berhemên xwe jî ziman dikemilîne. Ji berhemên ku nivîskî û devkî yên bi hunerî bûyer, raman, hest û xeyalan bi şêweyekî bedew/estetîk pêşkêşî guhdar û xwendevanan dike re tê gotin. Ew berhem mîna helbest, çîrok, roman, destan, zargotin, stran, şano û… hwd derdikevin holê û cîhana nîgaşî ya guhdar û xwendevanan dixemilînin. Di derheqê wêjeyê de pir tişt hatine gotin û hîn jî ew ê bêne gotin. wêje tê wateya hewldana nêrîneke berfireh û gerdûnî, bilindkirina merhamet û hezkirinê. Di vê dema nûjen de êdî nivîsandin pir hêsan e. Lewma ji bo parastina berhemek wêjeyî nivîsandin pêwîst e. Nivîskar bi herfan nêrîn, hest û xeyalên xwe bi awayek hunerî dineqişîne û digihîne xwendevanan. Lê ev nayê maneya ku edebiyat bi tenê ji berhemên nivîskî pêk tê. wêjeya Kurdî ji ber sedemên aşîkar hîn jî zêdetir devkî ye. Pêwîst e ku wêjeya nivîskî li ser hîmê wêjeya devkî were avakirin. Wê demê dewlemend, xurt û bedewtir dibe. Hinek beşên edebiyatê zêdetir bi devkî bandor dikin. Wê demê ji xwendevanan zêdetir guhdar derdikevin li pêş. Bêguman û bêşik, dengbêj û çîrokbêj xwedî û hostayên wêjeya devkî ne. Di gotinên wî/ê de fantazî û rastî, xewn û serpêhatî, bûyerên qewimî û çêkirî di nav hev de ne.“



Wêjevan ew kesên ku kilîta gencîneya ziman di destê wan de ye. Ew bi nivîs û gotinan peyîvên di xeyalên xwe de diafirîne, bi rêkûpêk û nîzamî didin berhev, dixemilînin, dinivîsînin, dibêjin û vedibêjin. Bi wan xeyal, raman, derd, kul û keserên xwe tînin ziman. Di vê hewldanê de sûdê didine derdora xwe, tûrê xwe berdidin bin bîra dilên xwe, wan bi tecrûbe, raman, hest, xeyal û hêviyên xwe yên cûrbecûr dixemilînin û pêşkêş dikin. wêjevan bi şêwazekî xweşik behsa însanan dikin, bi awayekî hunerî însan ji însanan re tarîf dikin. Dema mijar li ser mirov û mirovahiyê be wêjevan xwe, civaka xwe, herêma xwe jî vebibêje; ev vegotin gerdûnî û ji bo herkesî ne. wêjevan pirsgirêkên hemû kesên li rûyê erdê mîna pirsgirêkên xwe dibînin û ji bo çareseriya wan hewl didin. Ev hewldana gerdûnî sînor û tixûbên di dil û mejiyên mirovan de hatine danîn serûbin dikin, nêrîn û dîtinên berfireh didin ber wan. Ew êş û janên mirov û mirovatiyê ji xwe re dikin êş û jan, ji bona çareseriya wan tevdigerin. Bi duristkirin û tekûzkirina gotin û vegotinê niyet û meqsedên mirovan zelaltir dibin, baştir û duristir tên fêmkirin. Ev jî bi bêjinga edebiyatê gengaze.

wêjevan bi nêrînek berfireh li jiyana civakan dinere û şîrove dike. Di berhemên wî de hestyariyek û dilsoziyeke mirovhezî û gerdûnî heye. Ew ji xwendevanên xwe re dibe pêşeng û hişmendar.



## Xêr û Şer

Sîpan Şînda

Nirxên civakî di nava demê de têne hûnandin û di nava demê de dipijin. Her civakekê li gorî şiklê jiyana xwe, bîr û baweriyên xwe, şiklên têkiliyên xwe, erdnîgarîya xwe ji xwe re nirxan çêdike û di nava demê de jî her nirxekê ji xwe re qalibekê digire.

Di rastîyê de civak ji nirxan pêk tên û ew bi nirxên xwe li ser piya dimînin. Nirxên civakan jî ji bo wan pîroz in û ew ji nivşan dewrî nivşan dibine. Bê goman, nirx her tim weke xwe namînine û di nava demê de ew ji têne guhertin. Nivşên civakê li gorî nêrînên xwe guhertina têxine wan, ji ber ku gelek tişt li nivşên nû xerîb, yan jî bê wate têne. Gelek caran hinek nirx di nava demê de ji nava civakê radibine. Bi taybetî ji di serdema nûjen, ya paşnûjen û ya teknolojîyê de ev guhertin zêdetir û leztir çêdibine. Ji ber ku bi saya serê alavên teknolojîk û bikaranîna wan, civak gelek di bin bandora êkûdû de dimînin. Ji ber van alavan, nivşên nû jî ji guhertinê re vekirîtirin, ji ber ku ew tim bi teknolojîyê ve mijûlin û çav li êkûdû dikine. Lê belê hinek nirx jî hene ji hinan cudatirin û girîngtirin. Mînak nirxên jêre têne gotin xêr û şer.

Xêr û şer du peyvên bi wateyî dijberî hev in dema ev herdu peyv bi hevre bêne bikaranîn, dibe biwêjek û wate û girîngiya nirxên civakî dide. Xêr û şer, weke biwêj, rastiya jiyana civakî tîne ziman. Ango rojên xweş û nexweş. Jiber wê, bi hevrebûyîna xêr û şeran de, ji bo civakê giring e. Dema mirov ji hevdûre dibêjine ‘Em li ser xêr û şerê yêkin’, ev tê wateya ku ew kes di rojên xweş û nexweş de li cem hev in. Girêdaneke wan ya ji dil heye û dema belayek, nexweşîyek di ser aliyekê de tê alîyê din jî wan tenê nahêle û xema wan parve dike. Mînak mirin, qeza, nexweşî tiştên xirab in ku mirovan xemgîn dikine. Dema mirîyek yê mirovî çêdibe, yan mirov nexweş dikeve, yan jî qezayekê derbas dike, tê dît dost û heval û xizim hemî li ser mirovî de hatin û xema mirovî parve kirin. Dîsa di dema xwazgîniyan de, şîranî, taştê û dawet û şahîyan de jî hezkiriyên êkûdu diçine cem êkûdu û keyf û şahîyên xwe bi hev re parve dikine. Herweha di rojên xweşî de jî, mirov van kesan li dora xwe dibîne. Lê bi ferqekê, di rojên şeran de, ango dema nexweşî li ser mirovî de tê ew kesên ku têne li cem mirovî ji ber xwe têne, ango li hawarê têne, lê belê dema têne li ser xêrên mirovî, mirov wan vedihewîne.

Tinê nehêlana êkûdu di xêr û şeran de, ji bo herkesê weke peywirekê ye. Dema yek ji herduyan de, bê sedem mirov ne li cem hevdu bin, mirov xwe li himberî hevdu sûcdar dibînin û bi wijdanî nerihetin. Ji ber ku li gorî wan, ewan peywira xwe pêk neanîne û nirxên civakî binpê kirine. Ango ne li gorî nirxên civakî hereket kirin sûcek e wijdanî ye. Jixwe sûcê herî mezin jî ew e ku wijdana mirovî bi êşîne. Ji niha ve sala nû li we hemiyan pîroz be.

# Desteya Jîngehê parêzvana jîngeh û xwezayê ye

Hevserokê Desteya Jîngehî ya Rêveberiya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ibirahîm El-Esed diyar kir ku Desteya Jîngehî di 29'ê Gulana 2023'an de bi rengekî fermî bi biryara Rêveberiya Xweser di Meclisa Qanûnsaz de, hat ragihandin, da ku gavine mezintir di aliyê parastina jîngehî de bên avêtin.

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

Di çarçoveya parastina jîngehê de, di sala 2023'an de 138hezar û 188 dar hatin çandin, bi dehan park hatin vekirin û 3 daristan jî hatin vekirin. Desteya Jîngehî li ser du qonaxan tê nirxandin qonaxa beriya avakirina desteya jîngehî û qonaxa piştî avakirinê. Beriya 29'ê Gulanê bi navê qomîteya jîngehî, girêdayî rêveberiya giştî ya şaredariyan kar û xebatên wê dihatin meşandin, beriya ku bibe deste kar û xebatên wê di çarçoveyeke teng de bû, piranî di aliyê dar çandiniyê de bûn û di warê şitilgehan de mijûl dibû, li ser wê bingehê kar kêm dima. lewra Rêveberiya Xweser li gorî Piradîgmaya Netewa demokratîk ya ku xwe dispêrininê, biryar dan ku pêwîstî heye ku kar û xebatên jîngehî pêşbikevin, êdî qonaxek din dest pêkir, li gorî fikir, felsefe û Peradîgmaya Netewa Demokratîk, li aliyekî din pergala Rêveberiya Xweser bi dehan semîner, çalakî û kampanî çêkirin ji bo xwedî derketina li jîngeh, çandina daran û ji bo belavkirina ramanên jîngehî û avakirina civakeke jîngehî.

Di derbarê kar û xebatên Desteya Jîngehê ya sala 2023'an de Hevserokê Desteya Jîngehê ya Rêveberiya Xweser a Herêma bakur û rojhilatê Sûriyê Ibirahîm El-Esed ji rojnameya me re axivî.

### Kar û xebatên Desteya Jîngehî

Hevserokê Desteya Jîngehî ya Rêveberiya Xweser a Herêma bakur û rojhilatê Sûriyê Ibirahîm El-Esed diyar kir ku nav gewdên Rêveberiya Xweser de gavên ber biçav hatin avêtin di hemû qadan de, lê di aliyê jîngehî de pir kêm mabû û wiha got: "Bi ragihandina Desteya Jîngehî, Rêveberiya Xweser xwest wan gavên kêm mayînê yên jîngehî bighîne asata ku Rêveberî gihayê de, êdî di nav hemû qadan de dengvedanek çêbû, giraniya Rêverberiyê di aliyê jîngehî de hat destnîşankirin, lewma li gorî derfetên heyî, desteyê hin kar û xebat dan meşandin, ji van kar û xebatan yên ku ber biçav hatine xuyanîkirin; Avakirina akademiya jîngehî ya herêma bakur û rojhilatê Sûriyê ye ku



bi rengekî fermî di 1'ê Mijdarê de hat vekirin û kar û xebatên xwe dide meşandin , ev akademî xwedî taybeymendiyeke ku pergala xwe ya kilasîk pêtir dispêre sê qomîteyan; Qomîteya perwerdeyê, Infirmasiyon û qomîteya lêkolînên jîngehî, kar û xebatên xwe wek navandan li ser pergala jîngehî dide meşandin, di van şeş mehan de rêxistinkirina xwe di aliyê rêveberî de jî xwest bide meşandin û pergala xwe birêxistin bike."

### Astengiyên ku Desteya Jîngehê rastî wan hat

Ibrahîm El-Esed berdewamî da axaftina xwe û wiha got: "Astengiyên ku li pêşiya me derdikevin wê her tim derkevin, ji ber ku tu kar û xebat nînin û rastî astengiyan nayên, mînaka berbiçav Rêveberiya Xweser e, ku çawa xwe ragihand di nav şert û mercên zehmet û karî xwe bighîne asta ku îro tê de ye. Wekî Desteya Jîngehê ji gewd û pergala Rêveberiya Xweser nequtkirî ye, zehmetiyên me ew hişmendiya ku li ser me hatinbû rûniştandin bi dehên salan û dûrketina ji civaka jîngehî, em hewil didin ku karîbin pêşiya vê zihniyeta kevneşop, ya ku di nav civakê de, bisekinin û pergala Xweseriya Demokratîk bi civaka xwe bidin nîşandan, ku civaka jîngehî , civaka rihê pergalê û civakbûnê ye, mirina xwezayê mirina civakê ye, her wiha akademiya jîngehî bi rola belavkirina çand û hişmendiya jîngehî û xwedî derketina civakê li jîngeha ku têde radibe."

### Zirarên ku dighêjin jîngehê

Ibrahîm El-Esed wiha dewam kir: " Di asta Herêma bakur û rojhilatê Sûriyê de, ku em li asta jîngehê bigerin, bi taybet di van 12 salên şoreşê de, hin guhertinên ber biçav çêbûn, beriya Şoreş Rojava, herêma bakur û rojhilatê Sûriyê paşguh kirî bû di aliyê sîstem û pergala rêjîma Beis'ê de, di heman demê de ew bandora neyînî ya êrîşên dewleta Tirk û ceteyên wê li ser xweza û jîngeha bakur û rojhilatê Sûriyê kirin, bi taybet em ji Efrînê dest pê bikin ku rojane bi dehan darên zeytûnan tên birandin û guhertina demografîk jî li wir çêdibe. Di heman demê de li Serê Kaniyê jî ku çawa Dewleta Tirk bombeyên kîmawî bi kar anî, ev jî bandorekî li jîngehê dike, bi êrîşên DAIŞ'ê li ser herêma bakur û rojhilatê Sûriyê ku bi dehan daristan û zirarên ku gihandin xwezayê û zindiyên ku hene, her wiha mijara qutkirina ava Hesekê ev jî banorekî li xwezayê dike, bendava çemê Firatê ku Dewleta Tirk sîyaseta xwe ya bi riya qutkirina avê êrîşî herêma bakur û rojhilatê Sûriyê dike, gava ku em li vê yekê dinêrin, dibînin heya çi astê Dewleta Tirk bandoreke xerab



li jîngeha me kiriye, li aliyekî din pergala Rêveberiya Xweser bi dehan semîner, çalakî û kampanî çêkirin ji bo xwedîderketina li jîngehê, herwiha çandina daran û ji bo belavkirina ramanên jîngehî û avakirina civakeke êkolojîk, di sala 2023'an de 138hezar û 188 dar hatin çandin, bi dehan park hatin vekirin û 3 daristan jî hatin vekirin.

### Hejmara darên ku di sala 2023'an de hatin çandin

li kantona Cizîrê di 4'ê Nîsanê de hezar dar hatin çandin, kampaniya roja jîngehê 700 dar, kampaniya çandina daran li dibidtanan 450 dar hatin çandin.

Li Herêma Firatê kampaniya di her malekî de darek 7hezar dar hatin belavkirin û çandin, her wiha 600 dar di 4'ê Nîsanê de hatin çandin.

Li Minbicê 4 hezar û 500 dar hatin çandin, li Tebqayê di bin navê kampaniya çandinina daran de, 39 hezar 500 dar hatin çandin, her wiha 10 hezar dar li daristanan hatin çandin.

Li Reqayê 11 hezar 771 dar hatin çandin, her wiha hijmara giştî daran ku li Herêma baku û rojhilatê Sûriyê hatin çandin 137 hezar û 883 dar hatin çandin.

### Kampaniyên ku li Herêma bakur û rojhilatê Sûriyê hatine li darxistin

-Kampaniyên ku li Minbicê hatin çêkirin di sala 2023'an de; parastin ji bo laşmaniya, qirêjiyên bilastîkê, herwiha kampaniya çandiniya daran li dibistanan û li 4 daristanan.

-Kampaniyên ku li Cizîrê hatin çêkirin di sala 2023'an de; Kampaniya bi navê erê ji bo jîngeheke kesk û paqij re, roja jîngehê ya cîhanî, 4'ê Nîsanê, em jîngeha xwe biparêzin û paşeroja xwe avabikin, bi hev re ji bo jîngeheke bê gemar, her wiha semînerên ku hatin dayîn ; jîngeh û bilastîk, girîngiya jîngehê, jîngeh û tenduristî, zivrandin û guhertîna avhewayê û belavkirina hişmendî, zagona parastina jîngehê, zagona paqijiyê û ekolojiya famînîst, û li 10 daristanan jî dar hatin çandin.

Teqîgehek jîngehî ya li Reqayê yekem e ku li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê, ji aliyê alavên xwe ve û makanîzmaya karkirina wê ev teqîgeh çavdêriya sê hêmanên jîngehî ve girêdayî ye wek ;av, hewa û ax, bi riya tîmên çavdêrkirinê çavdêriya vî karî tê kirin, her wiha bandora vê teqîgehê di serî de li ser pêşesazî, çavkaniyên avê û pîşeyên pîşesaziyê û tevî çalakiyên ku bandorê li hêmanên jîngehî dikin, her wiha encamên wê li ser bingeha kalîteya jîngehê û standardên ewlehiyê yên ku ji hêla komîteya jîngehê ve hatine pejirandin û encam bi standardan re hevaheng dike û raporên pêwîst pêşkêşî dezgeha şopandina jîngehê dike da ku bi karê pêwîst rabe.

### Perwerd û waneyên ku li Reqa hatine dayîn;

- Ofîsa perwerdeyê ya dibistanan: Ku rola wê pêkanîna çalakiyên hişyariya jîngehê û perwerdehiyê di nav bexçeyên zarokan û dibistanan deye, ku têgîna jîngehê tê ravekirin û pêşxistin. Reftara jîngehê û kampaniya çandina daran li dibistanan da hat destpêkirin ku bi peşdariya mamosate û xwendekaran hat li dar xistin, bi armanca gihandina peyamên jîngehê ji vî nifşên nû re, ku tevkariyê li parastin û mêvankirina pexçeyên zarokan ji bo dîtina Komîteya Kar û barên Jîngehê ji bo fêrbûna li ser prosesa çandina şitilgehan, perwerdekirina ji bo parastina wê û jîngehê.

- Nivîsgeha Ragihandin û Pêwendiyan: Pêwîste hemû karên komîtê bi belgekirina wan bi wêne, vîdyo û raportan ve bigre û avakirina pêwendiyan re jî bi komîteyên din re ji bo belavkirina hişmendiya çandî ya jîngehê di civakê de.

-Ofîsa Bername û Hişyariya Jîngehî: Ew pişta xwe bi dîzaynkirina poster û broşûrên haydariya jîngehê û perwerdehiyê tê kirin, da ku beşdarî belavkirina hişyariya jîngehê di civakê de bibe dezgehê, her wiha destpêkirina kampanyayên çandiniya daran di nava park, dezgeh û kampan de, bi beşdariya karmend û şêniyên kampê ji bo zêdekirina çarçoveya keskahiyê û kêmkirina guherîna avhewayê.

Li Tebqayê kampaniya çandina 2 melyon dar, çandiniya 5000 dar û 100 hazar dar hat kirin, her wiha kampaniya jîngeha me bingeha tevgera me ye dest pêkir, di heman demê de kampaniya bi navê nivşên pêşerojê û girîgiya jîngehê û pêwîstiya parastina wê hat li darxistin. Li 5 darisatan dar hatin çandin.

Li Firatê kampaniya 4'ê Nîsanê, di her malekî de darek, belavkirin daran li saziyên sivîl û lêşkerî pêk hatin, her wiha ji bo parastina jîngehê 3 daristan hatin vekirin binavê; şehîd Baz û şehîd Xeyrî.



# Bîlançoya sala 2023'yan ya êrîşên dagirkeriya Tirk

Îsal dewleta Tirk a dagirker nêzî 650 caran bi awayekî hovane êrîşî tevahiya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Di encama van êrîşan de 47 sivîl û 62 şervanên QSD û Hêzên Ewlekariya Hundirîn şehîd ketin û zêdetirî 34 navendên xizmetguzarî û binesaziya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk hatin ruxandin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker bi destpêka sala 2023'an re mîna sala borî êrîşên xwe li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam kir. Dewleta Tirk a dagirker bi berfirehî bi rêya firokên cengê, diron û herwiha çekên giran êrişên xwe yên hovane li dijî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji nû ve dest pê kir. Dewleta Tirk a dagirker da ku siyaseta koçberkirin û birçîkirinê, di heman demê de tirsê bixe nav gelan, jêderên jiyanî û binesaziya Rêveberiya Xweser armanc girt. Li gorî Ragihandina QSD'ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û şopandina rojnameya me ji êrîşên dewleta Tirk a dagirker re encamên êrîşên dagirkeriya Tirk yên sala 2023'an yên li ser herêmê wiha bû:

Hejmara êrîşên dagirkeriya Tirk li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên Çileya 2023'an 55 hedef bûn 42 bi çekên giran 2 caran bi doşkayê û 9 caran bi dronê bûn.

Di enncamê de jî şervanekî QSD'ê şehîd bû û 2 sivîlan jiyana xwe ji dest dan û yek jî birîndar bû.

Di Sibatê de jî 22 hedefên cuda li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji aliyê dagirkeriya Tirk ve hatin pêkanîn. Dagirkeriya Tirk 11 caran bi çekên giran 3 caran jî bi çekên sekvaniyê. Mayînek teqandin û 2 caran bi dronan êrîş kir.

Di encama van êrîşan de jî şervanekî QSD'ê, kalemêrekî 70'î salî û kedkarek şehîd ketin. Di heman demê de 8 kesên sivîl birîndar bûn, di nav wan de 2 jin jî hebûn.

Di Adarê de jî hejmara êrişên dagirkeriya Tirk 21 êrîş bûn û 19 caran jî bi çekên giran û 3 caran bi çekên sekvaniyê, mayînek da teqandin û 2 caran bi dronan êrîş kir.

Di Nîsanê de 25 êrîş pêk hatin 23 caran bi çekên giran û 2 caran jî bi dronan Herwiha zêdetirî 1130 topên hawan, tank û mûşekan, gelek herêm hatin armanc kirin. Dagirkeriya Tirk komkujiyek li gundê Eyn El-Ebd yê girêdayî Til Temirê pêk anî, di encamê de 3 zarokan jiyana xwe ji dest dan û 2 zarok jî birîndar bûn. Herwiha xebatkarên tenduristiyê yên ku ji bo alîkariya tendurstî ji sivîlên ku erebeya wan li ser rêya Eyn Îsa ya nêzî gundê Debsê wergeriya, re pêşkêş bikin, ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hate hedefgirtin û şervanekî QSD'ê jî şehîd bû.

Herwiha di meha Gulanê de dewleta Tirk a dagirker 18 caran êrîşî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, 14 caran bi çekên giran 2 caran bi çekên kilêş û sekvaniyê û 2 caran bi dronan kir.

Di encama van êrîşan de jî şervanekî QSD'ê û şervanê Hêzên Parastina Kampa Holê şehîd ketin. Di heman demê de 2 sivîlan jiyana xwe ji dest dan û 10 kes jî birîndar bûn, herwiha 4 zevî hatin şewitandin.

Di meha Pûşberê de 69 hedef, 33 caran bi çekên giran, 14 caran bi çeka kilêş û sekvaniyê, herwiha mayînek hat teqandin 18 caran bi dironan lêdan çêbû.

Di encama van êrîşan de, 11 şervanên QSD'ê şehîd ketin 7 sivîlan jiyana xwe ji dest dan û 7 jî birîndar bûn di heman demê de 3 zevî hatin şewitandin.

Di meha Tîrmeh de 45 hedef, 40 ji wan biçekên giran 5 caran bi dronan lêdan çêbû.

Di encama va êrîşên hovane de jî 4 endamên hêzên xweparastinê şehîd ketin, Ekîbeke tenduristiyê hate hedefgirtin û 2 kes birîndar bûn.

Herwiha 3 kesên sivîl jiyana xwe ji dest dan, yek ji wan zarok bû û 8 kesên din jî birîndar bûn û 3 zevî jî hatin şewitandin.

Di meha Tebaxê de 67 caran û 18 caran bi dronê di encamê de jî 7 şervan şehîd ketin. Herwiha 4 kesên sivîl jiyana xwe ji dest dan, ji wan jineke bi temen mezin bû.

Di heman demê de jî 4 şervan û 14 kesên sivîl birîndar bûn, ji wan 2 zarok û rojnamevanek.

Di meha Îlonê de jî hejmara hedefên ku bi çekên giran pêk hatin 177 cih bûnû 8 caran jî bi dronê lêdan çêbû.

Dagirkeriya Tirk li gundê El-Şerqa yê bajarokê Silûk komkujiyek pêk anî û di encamê de 3 kesên sivîl şehîd ketin û 3 sivîlên din jî birîndar bûn.

Herwiha ekîbeke telfezyona JIN TV hate hedefgirtin û di encamê de ajokar jiyana xwe ji dest da û rojnamevanek jî birîndar bû.



Di heman demê de jî 10 kesên sivîl jiyana xwe ji dest dan yek ji wan girêdayî Erka Xweparastinê bû û 5 şehîd jî endamên QSD'ê bûn.

Êrîşên ku di meha Cotmehê de pêk hatin 132 êrîş bûn, 82 caran bi çekên giran û 50 caran bi firokên bêmirov. Di encama van êrîşên hovane de jî 29 ji hêzên Dijî Madeyên Hişbiriyê şehîd ketin û 28 endam jî birîndar bûn. Di heman demê de jî 2 hêzên QSD'ê û 6 endamên Asayîşê, 10 kesên sivîl şehîd ketin û 20 kesên sivîl jî birîndar bûn. Dagirkeriya Tirk 34 navendên xizmetguzariyê û binesaziya herêmên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ruxand.

Di meha Mijdarê de jî 27 êrîş pêk hat, 11 caran bi firokên bêmirov, carekê jî bi çekên sekvaniyê. Di encamê de şervanek şehîd ket û 2 şervanên din jî birîndar bûn û 4 kesên sivîl jî jiyana xwe ji dest dan, 21 birîndar bûn di navde du zarok bûn.

Êrîşên dawiyê yên meha Berfenbarê yên herî dijwar bûn ku li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê rûdan û herî zêde bajarê Qamişlo û gund û navçeyên girêdayî wê kirin hedef. Dewleta Tirk a dagirker êrîşên hewayî yên di 23'ê Berfanbarê de bi armanca tirsandin û qirkirina gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dabû destpêkirin, ku heta 26'ê Berfanbarê jî ev êrîş berdewam kirin. Di van êrişan de dagirkeriya Tirk nêzî 50'î caran êrîşî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, 7 caran bi firokên cengî û 33 caran bi dironan ev êriş hatin kirin.

Di encama van êrîşan de jî 8 sivîlan jiyana xwe ji dest dan, 18 kesên din jî birîndar bûn. Di heman demê de 2 nexweşxane, navendeke tendirustiyê ya şuştina gurçikan, kargeha helberîna oksijênê, stasiyonên elektirîkê, benzînxane û hwd… hatin hedefgirtin.

Di encama êrîşên hovane li ser sitasiyonên elktrîkê de, zêdetirî 2 hezar û 600 gund û bajar bê elektrîk man.

# 'Revandina Silêman Ehmed kiryareke derqanûnî ye'

**Reşo Mihemed/Qamişlo**

**Endamê Yekîtiya Parêzerên Kantona Cizîrê Xalid Umer da zanîn ku PDK'ê bi hincetên ji rastiyê dûr rojnamevan Silêman Ehmed revand û wiha got: "PDK'ê bi revandina Silêman Ehmed kiryareke derzagonî kir."**

Ev bû 68 roj ku edîtorê Rojnwesê, Silêman Ehmed ji aliyê PDK'ê ve hatiye revandin. Silêman ji Efrînê ye û piştî dagirkirina Efrînê ji aliyê dagirkeriya Tirk ve diçe Başûrê Kurdistanê û li Silêmaniyê di nava xebatên ajansa Rojnwes de karê rojnamegeriyê dike. Di roja 25'ê Cotmehê de û dema Silêman Ehmed xwest di heman riya tê re derbasî Rojava bû vegere ser kar xwe, lê li deriyê Sêmalka ji aliyê PDK'ê ve hat revandin. Piştî revandina wî bi çend rojan asayîşa PDK'ê ya Dihokê bi daxuyaniyekê ji rastiyê dûr ragehand ku wan Silêman Ehmed revandiye. Ji dema revandina wê ve



û heta niha PDK'ê nahêle ne malbat û ne jî parêzer wî bibînin.

Têkildarî revandina Silêman Ehmed endamê Yekîtiya Parêzerên Kantona Cizîrê Xalid Umer ji rojnameya me re axivî.

### 'Girtina rojnamevan Silêman Ehmed kiryareke derzagonî ye'

Parêzer Xalid Umer diyar kir ku PDK'ê bi hincetên bêbingeh rojnamevan Silêman Ehmed bi kiriyareke dijî dadweriyê binçav kir û wiha got: "Weke em dizanin Silêman Ehmed piştî ku serdana malbata xwe kir û ji Rojava vegeriya Başûrê Kurdistanê, PDK'ê wî bi hinceta ku li dijî kurdperweriyê kar dike, revand. PDK'ê bi vî awayî bi hincetên nerast, rojnamevan Ehmed da girtin, ger wisa ye çima dema ku berî serdana malbata xwe bike, vê biryarê di derheqê wî de bide?. Lê tekez e ku PDK'ê bi vê biryarê karekî istxbarî dike û hinceta ku Silêman Ehmed li dijî kurdperweriyê kar dike, dide pêş. Parêzeran xwestin ku hevdîtinê bi rojnamevan Silêman Ehmed re çêkin, dadwerê Dihokê, erê kir ji bo xwesteka hevdîtinê, lê esayîşa Başûr nehişt ev hevdîtin pêk were. Lewma em dibînin ku biryara revandin û tecrîdkirina Silêman Ehmed kiryareke dûrî mafê mirovan e. "

### 'PDK û AKP'ê heman kiryaran derheqê rojnamevanan de dikin'

Umer da zanîn ku PDK û AKP'ê heman siyasetê di warê hedfgirtin, revandin û binpêkirina rojnamevanan de dimeşîmin û wiha domand: "Ger mafê rojnamevanan parastî ba, pêwîstî bi girtina Silêman nedikir. Vaye hat girtin, divabû têklî di navbera wî û parêzeran de nehata qutkirin, lê heta niha PDK'ê nehiştiye malbat û parêzerên Silêman Ehmed hevdîtinan çêbikin. Li gorî danezana cîhanî ya mafê mirovan bi xala xwe ya 9'an, 10'an, 11'an û hwd… ku ger mirovek were girtin çênabe were tecrîdkirin. Herwiha divê parêzerek ji wî mirovî re were destnîşankirin û çênabe ew mirov bê hebûna parêzerê xwe bersiva pirsekê bide. Lê kiryarên PDK'ê li Başûrê Kurdistanê di warê rojnamevanan de û bi taybet revandin û tecrîdkirina Silêman Ehmed binpêkirina mafên mirovan e. Di heman demê de tê xuyakirin ku çiqasî PDK'ê û dewleta Tirk a faşîst di warê hedefgirtina rojnamevanan de mîna hev tevdigerin. Ji xwe eşkere ye ku dewleta Tirk a faşît di îşkencekirin û binçavkirina rojnamevanan de li ser asta cîhanê nimûneya herî berçav e. "

### 'Divê sendîqayên rojnamevaniya Başûr bi erkê xwe rabin'

Parêzer Xald Umer destnîşan kir ku divê sendîqayên rojnamevaniyê yên Baûr ji bo azadiya Silêman Ehmed û hemû rojnamevanan bi erkê xwe rabin û wiha anî ser ziman: "Îroj Silêman Ehmed di bin tecrîdeke giran de ye û çarenûsa wî ne diyar e. Heta ku Silêman Ehmed ji bin tecrîda girankirî derkeve, parêzer û malbata wî, hevdîtinê pê re çêbikin, pêwîst fişar li ser PDK'ê û hikumeta Başûr were kirin. Ev yek jî erka sendîqayên rojnamevaniya Başûr û Îraqê, rojnamevanên bêsînor e û pêwîste daxwaziya azadiya Silêman Ehmed û hemû rojnamevanên din bikin. Ger ku hikumeta Başûr û PDK'ê derfetê bidin parêzeran wê parêzer destwerdanê ji bo dadewriya Silêman Ehmed bikin û bi erkê xwe rabin. "

# Gazind û belengazî ji dijmin re nabe bersiv!

**Volqan Elî**



Ji beriya pênc-şeş salan dagirkeriya Tirk hem li ser Rojava û hem jî li ser Herêmên Parstinê yên Medyayê êrîşên xwe zêde kirin. Bi taybetî li herêmên wekî Xakûrkê, Heftanîn, Metîna, Zap û Avaşînê tevgereke mezin a dagirkeriyê bi pêş xist. Lê piştî demekê fêm kir ku xiyaneta PDK'ê û bermahiyên ku ji DAIŞ'ê dane hev û birine serê wan çiyan, nikare xwe li çiyan ragire. Heta vê derê her tişt tê fêmkirin; asayî ye. PDK'ê xiyanet kir, beşeke Kurdistana pîroz pêşkêşî Tirkên dagirker kir; gerîla li ber xwe da. Gurên boz ên Faşîstê Behçelî û Erdogan êrîş kirin; gerîla bi fedekariyeke mezin li ber xwe da. Ev, ne berxwedaneke ji rêzê bû; dîrokî ye. Lê ev jî asayî bû. dijminê gelan êrîş dike; Hêzên Parastina gelan jî li ber xwe dide. Ev jî tê fêmê; asayî ye.

Di vir de tiştê eceb, ev e: her ku dagirkerî li Başurê Kurdistanê tengav bû yan jî ji Hêzên Parastina Gel derb xwar êrîşê Rojava, yanî Rojhilat û Bakurê Sûriyeyê kir. Par, pêrar,… dîsa hin caran jî bi bahaneyên bê mane êrîşê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir, û dike jî. Hin caran êrîşên xwe gihandin asta herî mezin. Ji derveyê vê erîşên dagirkeriya Tirk her bê navber berdewam dikin.

Di serî de QSD, YPG û YPJ û HRE dem bi dem bersiva hêzên dagirker da û dide. Di vê mijarê de tiştekî neyê fêmkirin tine ye. Lê belê xuya dike, ev, ji bo parastina gel têrê nake. Her roj li ser Şehbayê, Kobanê, Minbic… bi tang, top û balafirên bi mirov û bê mirov êrîş hene. Jixwe wekî me got, di astekê de berxwedana gel û hêzên parastinê jî heye. Dijminê dagirker, êrîşên xwe di sînorekî bi sedan kîlo metre dirêj de berbelav kiriye. Nabêje, ev kargeh e, ev cihê însanên sivîl e, ev xwendevan in, ev mizgeft e û hwd. dide ber top û balafiran.

Niha, dijmin ji xwe re her tiştê di tevgerê de yan jî sekinî, yê li vî milê sînor kiriye hedef, lê dide. Em nabêjin, em jî wekî Îsraîl û Hamasê hema bidin nav. Na! Şerê me yê azadî û rizgariyê ti car bi hişmendiyeke wisa nemeşiyaye! Eger wisa bûya welatparêzeke/î li Tirkiye û Bakur jiyandikir a/ê fedayî dikarîbû bi çend kîlo jahr biavêje depoyekîi avê taxên bajarekî wekî Stenbol-Enqere û hwd. bi hezan kesî bikuje (?) em vê rêbazê ji binî de nelet dikin! Ya ku em dibêjin ne ev. Ev ne parastina rewa ye! Dibe ku feraseta Hamas û Îsraîlê ya parastina rewa wisa be. Lê ya me ne wisa ye. Em dibêjin çawa ku armanc û hedefa me paqij e; divê rêbaza ku em ê bi kar bînin jî pak û paqij be. Mînak, bi sedan hedefên dijmin (wekî qerol, avahiyên sabit ên hêzên leşkerî) hema li ber lêvê sînor in. Bêyî ku teknîkên pir mezin hebe, yan jî kesek bi ser de here ev dikarin werin îmhakirin. Niha civak vê meraq dike, hêzên me yên leşkerî ew ê kengî vê mafê bi kar bînîn?

Tiştekî din jî balê dikişîne; hêza gel a parastina rewa pir mezin e (dixwaze bila leşkerî be yan jî medenî be) em wekî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê vê hêzê têra xwe naxin dewreyê. Dijmin rojane êrîş dike, binesazî û her tiştî dide ber xwe, lê dide û îmha dike. Hin caran êrîşa li Enqerê ya du fedayiyên Tabûra Nemiran dike bahane; cara dawî gerîla ji bo ku erdên Başûr biparêze di binê berf û sir û seqama çiyayên asê de gurzê mirinê li Zaxrosan li dijminê xwînxwar da (19-20 Kanûnê); ew jî tê kerba serê xwe ji Rojava derdixe. Ji ber vê yekê çi hêzên leşkerî, çi civakî dibe her kes xwediyê wê mafê ye ku li dagirkeriya Tirk bide û li ber xwe bide. Ji ber ku hêzên leşkerî di karê parastinê de pispor in di vê mijarê de serkêşî jî wezîfeya vê hêzê (ji QSD heta bi HRE'yê) ye. Eger fikra me ew be ku "dijmin mezin e, hêza wî pir zêde ye û em dengê xwe zêde dernexin belkî êrîşên xwe sivik bike. Dibe ku gerîla derbeyên mezin lê dabin, pir êşiyabe ew ê ji bîr bike." Dijmin ti carê ji bîr nake, ew ê hewl bide ku heyfa xwe ji pitika di dergûşê de ye bistîne. Nabe, nabê, lê eger karibe gerîla tasfiye bike, taştiya wî Rojava ye; xiyaneta mala Barzanî jî heta bi paşîjva xwe destûrê didê û paşê bi hemû çilekiya xwe wî jî dadiqurtîne. Ji beriya ku ev rewş bi serê me de were, em wekî hêza leşkerî û civakî bi wezîfaya xwe rabin! Naxwe, gazind û belengazî ji dijmin re nabe bersiv!

# Dagirkeriya Tirk bi êrîşên xwe xwest careke din xwe îsbat bike

**Rustem Jiyan**

Bêguman di demên beriya niha de dewleta Tirk bi êrîşên xwe yên li ser qadên parestina mediyayê de xwest di hin mijaran de xwe îsbat bike, û bide diyar kirin ku çiqasî hêzeke mezin e. Lê ev hemû ne rast derket, Erdogan bi çeteyên xwe ve heye û li ser vî bingihî cihanê bi wan dide tehdîdkirin. Yanî dikare bê gotin ku ji sala 1983'an û vir ve ev qad di bin bandora hêzên gerîlayên azadiyê de ne û ji wan salan û vir ve her dem li ser vê erdnîgariyê êrîşên dewleta Tirk ên bejayî û hewayî tên kirin, lê heta îro jî bi ser neketine. Ev çil sal in êrîş li ser qadên gerîlayên azadiyê çêdibin. Di salên destpêkê de bi topên hawan û helîkopterên şer êrîş dikirin, piştre topên obus ên menzîldirêj anîn, piştre helîkopterên kobra û balefirên F16 anîn, niha jî balefirên bêçek bi kar tînin. Her roja tê teknîka xwe û kujêriya xwe bilindtir û xurtir dikin, lê tevî vê jî nagihêjin armanca xwe û nikarin ji wê erdnîgariyê gerîla dûr bixin.

Her weha dikare bê gotin ku dewleta Tirk êdî hatiye li ber asta têkşikestinê ku lewma ewqas êrîşî Qada Parastinê ya Medya, Başûr û Rojavayê Kurdistanê dike. Bi taybet ji bo ku xwe li ser piyan bigire, bi desteka hêzên noker ên mîna PDK'ê, li dijî Tevgera Azadiyê dixwaze Başûrê Kurdistan carek din dagir bike. Lewma rojane êrîşên xwe li ser herêmê zêde dike û bi destê nokeran dixwaze armanca xwe bi ser bixe. Ger merov li dîrokê bi rengekî rast binêre îxaneta ku bi Enkîdoyan re destpê dike, heya roja me ya îro di şexsê Barzaniyan de mirov bi hêsan dikare bibîne. Serkêşiya vê xiyaneta dîrokî, bi rihetî mirov dikare bêje PDK'e dikişîne. Ji ber ku tê dîtin Barzanî bi hemû hêzên xwe ên şerê taybet, bi Tirkiyê re li dijî destkeftiyên gele Kurd di nava her cure hevkariyê de ye. Bi vê ve jî namîne; heta ew gelê me yê ku ji ber şerê li Sûriyê koçberî Başûrê Kurdistanê bûne, wan ciwanên Kurd bi taybetî li beramberî Tevgera Azadiyê perwerde dike da ku pê bide şerkirin. Bi demê re hate dîtin ku di bin navê Pêşmergên Roj de û di bin siya PDK'ê de, li herêmen ku hezên gerîla lê hene xwe bi cî dikin û bi awayekî bêbex û veşartî şer dikin. Mîna xiyaneta salên 1992 û heya 1997'an dixwaze heman awayê xwe têxe bin cengê dewleta dagirker. Ya din jî, jixwe armanca Berzanî ew e ku li Başûr Kurdistanê nakokiyekî bixe li nava gelê Kurd û gelen herêmê. Lê belê êdî gelê herêmê vê xiyaneta wan û dîktatoriya Barzaniyan qebûl neke, heta li dijî wê di kêysa ewilî de wê rûxîne erdê. Lewra êdî eşkereye ku ti helwestên wan li beramberî dagirkerên axa Kurdistanê nemaye. Tam berovajîyê wê xwe radestî neyarê gelê Kurd kirine. Ji bo destkeftî û berjewendiyên gelê Kurd êdî bûne xeteriyeke herî metirsîdar.

Di van rojên derbasbûyî de dewleta



Tirk careke din êrîşî herêmeke pir mezin kir, ku ermanc ew bû careke din gelê me bê îrade ragire. Lê sekin û helwesta gelê me careke din îsbat kir ku dewleta Tir çiqasî êrîş bike wê nikare îradeya gelê me têk bibe. Ji xwe ji ber ku tê dîtin dewleta Tirk ku dinavê de Erdogan şerê ku li hrêma Parestina Mediyayê de diqewime nikare encam bigre, ji bona wê ye ku bi giranî êrîşî Rojavayê Kurdistanê dike. Bi kortasî rewşa ku niha diqewime bi yek hevokê mirov dikare rave bike. Tişta dewleta tirk li hember gelê Rojava dike tolhildan e. Ji ber ku nikare li hemberî îradeya gerîlayan bi ser bikeve, êrîşî Rojavayê Kurdistanê dike.



## Silav li sala 2024'an

**Ahmet Aktaş**

Em ê ji sala 2023'an xatir bixwazin û silavê li sala 2024'an bikin!
Lê divê em jibîr nekin ku em di salek dijwar re derbas bûn û bi heman mercên dijwar em derbasî sala nû dibin.
Belê gerîlayên gelê Kurdistanê, bi çalakiyên xwe yên dawiya 2023'an, têkoşîna vê salê tacîdar kirin û serdemek nû ya şoreşgerî dan despêkirin.
Di cîhanê de, mirov dikare behsa çend bûyerên giring ên vê salê wisa bike:
Şerê Ukraynayê, her çendîn ne mîna sala despêkê be jî, her dewam dike. Lê wxuya dibe ku aligirên vî şerî, ne serkeftîne.
Dibe ji ber encamnegirtina şerê Ukraynayê, şerê Israil û Hemasê hat despêkirin! Ev şer, di sala 2024'an de jî dewam dike.
Ev şer ji projeyên şerê cîhanê ya 3'an ên her du eniyên hegemonên cîhanê ne cûda ne. Yek eniya di pêşengiya DYE'yê û Ewrûpayê de, ya duda di pêşengiya Rûsya û Çînê de ye.
Di vê çarçovê de, ka em bala xwe bidin rewşa dewletên dagirker û Kurdistanê.
Irak û Sûriye, ji mêjve di bin gef û êrîşên dewleta tirk de bûn û di sala 2023'an de zêdetir bûn.
Bêgûman êrîşên giran li ser Başûr û Rojava bûn, di dawiya salê de êrîş dijwartir bûn.
Iraq, nêvînêvî di bin bandora DYE'yê û Îranê de ye.
Sûriye jî, nêvînêvî di bin bandora Rûsyayê û Îranê de ye.
Bêgûman êrîşên dewleta tirk, ne bêyî destûra dewletên hegemone! Bi taybetî jî li dijî Tevgêra Azadiya Gelê Kurdistanê, berjewenedên hegemonan dikarin bibin yek.
Mînaka li ber çavan: Dagirkirina Efrînê bi destûra Rûsyayê, dagirkirina Serêkaniyê û Girêspî jî bi destûra DYE'yê pêkhat.
Êrîşên ser Başûr ên Qadên Parastina Medyayê, Mexmûrê, Şingalê û hwd. jî bi destûra DYE'yê ye.
Hilbet li dijî van êrîşên ewqas piralî, berxwedana ji vê qiyasê mezintir û bi îradeya ji pola ya gelê Kurdistanê û dostê wê jî, di 2023'an de di meriyetê de bû.
Pêşengê vê berxwedanê gerilayên azadiya gelê Kurdistanê, bi çalakiyên dawiya vê salê, hinerên xwe yên nûjen ên serdema nuh, raxist ber çavê rayagiştî cîhanê!
Hilbet kevneperestiya herêmî û cîhanî, çavkaniya vî ruh û raman û îradeya ewqas bilind a berxwedêr, nasdikin ku İmraliyê ye!
Lewma, 25 sal e li ser Rêber Apo, polîtîka û kiryarên ewqas dijminkarane ku li ti deverê cîhanê mînakên wê nîne, didin meşandin.
Nêzî 3 salane tecrîd girantir kirine, yekcar agahî jê nîne; jiyana wî û her 3 hevalên wî di xeterê de ye!
Her alî bi vê rastiyê hesyane; ku mejî û dilê Rêber Apo, gerîla, gelê Kurdistanê û Tevgêra wê bûne yek, dostên navneteweyî jî zêdetir dibin, êdî ti hêz nikare wan ji hevdu dûr bixin.
Di dawiya vê salê de, bi vê çalakiya qehremanê ya gerîla ve, careke din ev rastî/heqîqet hat dîtin.
Wisa diyar dibe ku di 2024'an de, bi vê rastiyê kombûna li dor Rêberiyê xurtir dibe, serkeftin û jiyana hevpar a azad jî nêztir dibe!
Bi dirûşma "Ji Rêber Apo Re Azadi, Ji Pirsgrêka Kurd Re Çareserî û Jin Jiyan Azadî", Silav li te 2024!



# Pêngava azadiya Abdullah Ocalan

Bi druşmeya "Ji Abdullah Ocelan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî " ku di 10'ê Cotmehê de hatiya destpêkirin û li seranserî cîhanê belav bû ye. Bi deh hezaran kes tevlî vê kampaniyê bûn da ku bighêje armanca xwe. Pêngav xwedî giringiyeke taybete ku li cîhanê tev belavbûye û dostên gelê Kurd roj bi roj tevlîbûna wan ji kampaniyayê re zêdedibe.

**Deriya Çiya/ Qamişlo**

Rêberê gelê kurd Ebdullah Ocalan di 15'ê Sibata 1999'an de, bi komployeke navnetewî hate revandin û ji bona dewleta tirk ya qirker û faşîst hate radestkirin û xistin Girtîgeha Îmraliyê de. Ev 25 sal in di bin tecrîdê de ye. Tecrîd her ku diçe girantir dibe. 33 meh in destûr nadin ku Abdullah Ocalan bi malbat û parêzerên xwe re hevdîtinê bike.

Hewldanên ji bo rakirina tecrîda li ser Abdullah Ocalan didomin, herî dawî di 10'ê Cotmehê de Ji bo azadiya Rêber Apo. Kampaniyek Cîhanî ya bi dirûşmeya "Azadiya Fîzîkî ji bo Rêber Ebdullah Ocelan û çareseriya siyasî ji bona pirsgirêka Kurd" hate destpêkirin. Li gorî vê yekê kampaniya ji 74 navendên cîhanê dest pê kir û bi awayekî berfireh li tevahî cîhanê belav bû. Kampaniya xwedî taybetmendiyekê ye ku li cîhanê tev belavbûye û dostên gelê Kurd roj bi roj tevlîbûna wan ji kampaniyayê re zêdedibe.

**Kesên ku di vê kampaniyayê de beşdar bûne**

Pêngavek ango çalakiyek ewqas mezin ku li 4 parzemînan de bi hezaran sazî, rewşenbîr, akademîsyen, rojnamevan, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîstên mafên mirovan, fîlozof, kesên xelata nobelê wergirtine, saziyên jin û ciwanan, rêxistinên herêmî û bi dehan kesayetên navdar tevlê bûne.

**Çalakiyên kampaniya azadiya fêzîkî ya Rêber Ebdullah Ocelan**

**Li rojava**

- Di 4'ê meha Sibatê de daxwiyaniyek fermî, û bi tevlîbûna 100 endamî ji tevahî komîte, partî û saziyên jin hate lidarxistin.
- Di 3'ê Şibatê de panêlek li ser çima jiyan bê Rêbertî nabe ji milê Hîlala Zêrîn ve hat rêxistinkirin.
- Di 5'ê Sibatê heta 10'ê Sibatê ji gund, komîn, navçe û saziyan semîner li ser armanc û wateya kombloê hate dayîn.
- Di 4'ê Sibatê de bi pêşengtiya malbatên şehêdan, panêlek li ser azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hate dayîn.
- Di bin silogana "Azadiya Rêber APO Azadiya Mirovahiyê ye". Jinan di 15'ê Sibatê de meş li tevahiya navçeyan wek; Qamışlo, Hesekê, herêma firatê , Şehba û Helebê.
- Di 14'ê Sibatê de ragihandina kampaniya Haştag li ser tevnên civakî belav kirin.
- Şandina nameyan derbarê komploê de di rêya êmêl de, ji bona CPT'yê.
- li Hesekê bi armanca azadiya Rêber Apo, Kombûna Ol û Baweriyên Mezopotamiyayê civînek li Mizgefta Misebe Bin Omeyîr a li taxa Til Hecer a li bajarê Hesekê li dar xist. Derdora 75 oldarên ji bajar û navçeyên Hesekê û endamên Meclisa Jinan a Kongreya Îslama Demokratîk beşdarî civînê bûn.
- Meclisa Îslama Demokratîk a kantona Qamişloyê, civînek li hola Sandîqeya Karkeran a li bajarokê Rimêlan li dar xist. Îmam û meleyên navçeyên Ceza, Girkê Legê, Çilaxa û Dêrikê di civînê de hazir bûn.





**Li Bakur**

Kampaniya girava birçîbûnê di hundirê zindana Turkiyê û bakurê Kurdistanê de hate destpêkirin.

**Li Ewropa**

Ji bona azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bi meliyonan imze hatin komkirin. Bi dehan bilatforim li bajarên Ewropî hatin lidarxistin, wek nimûne li Lozanê bilatformek hat lidarxistin ji bo him şikenandina tecrîda li ser Rêbertî, û him ji bo çareserkirina doza kurd. Li pêş perlemana Elmanî Berlîn li bajarê Kolin, Firayborg hat lidarxidtin.

Çalakî li AWÛSTRALYA, SWÎSRE, FRANSA, AWÛSTÛRYA, AMERÎKA, SWÊD, DANÎMARKA, NORWÊC, FÎNLANDIYA, QIBRIS, HOLLANDA, BELÇÎKA, YEWNANISTAN, KANADA, ÎTALYA, ÎNGILISTAN, ROMANYA û POLANYA hatin lidarxistin.

**Xebatên pêngavê dê heta kengî bidome?**

Ev xebatên heyî dê heta azadiya fizîkî ya Rêbertî û çareserkirina pirsgirêka kurd wê berdewam bikin. Ji ber ku armanc azadkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Pêngava ku hatiye destpêkirin jî pêngaveke berfireh e. Ji ber ku ev pirsgirêk tevahî bi azadiya Rêber Apo ve girêdayî ye. Bi giştî mirov dikare bibêje azadiya Rêbertî azadiya tevahî gelê bindest e.

**Çima gelên cîhanê xwedî li Rêber Abdullah Ocalan derdikevin?**

Îro em vê yekê li Rojavayê Kurdistanê dibînin ku gelê ereb û suryan Rêber Apo wekî Rêberê xwe qebûl dikin. Ne tenê Rêberê gelê kurd e. Rêberê gelên Rojhilata Navîn e. Ew Rêberê mirovahiyê ye. Di sedsala 21'an de gelê Rojhilat ji bo xwe hêvî dibînin. Ji ber vê yekê şoreşa gelan û şoreşa jinê pêş dikeve. Gelên Rojhilat wekî Rêberê xwe qebûl dike. Rêber Apo bi riya reman, bîrdozî û felsefeya xwe ya ji bona azadiya cîhanê û mirovahiyê bû malê her kesî û ji bona vê yekê îro cîhan tev Rêber Apo dixwîne û ji bona azadiya wî li ser piya ye.

# 'Em ê her derê veguherînin qada berxwedanê'

**Çalakiya gireva birçîbûnê ku girtiyên azadiyê yên di girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê de di çarçoveya pêngava cîhanî ya bi dirûşmeya "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî" dane destpêkirin, di roja 35'an de didome. Berxwedêrên zindanan bang gelê kurd kirin ku her derê vegherînin qada berxwedanê.**



Li 104 girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê ji 27'ê Mijdarê ve girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê di çarçoveya pêngava 'Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêkê Kurd re çareseriya siyasî' de dest bi greva birçîbûnê ya dorveger kirine, çalakiya wan di roja 35'an de didome.

Girtiyên siyasî yên li Girtîgeha Hejmar 2 ya Rihayê ku ew jî ketine greva birçîbûnê, têkildarî çalakiya xwe nameyek şandin. Girtiyan, diyar kirin ku di qonaxeke dîrokî de ne û wiha gotin:"Pergala zilmê ya li ser qirkirina gelan hatiye avakirin 100 sal li pey xwe hişt. 100 sal berê dema împaratorî hilweşiyayî, derfetên azadiyê ji bo gelan çêbûn lê hinek jê weke qurbanî hatin hilbijartin û rû bi rûyêrastî qirkirinê bûn."

**Dixwazin şermê bidawî bikin**

Girtiyan destnîşan kir ku Hasan Hayrî ji bo parlamenteriyê li Qoçgiriyê xiyanet kir û got:"Ji ber ku bi cil û bergên Kurdî çû Meclisê, hate bidarvekirin. Berxwedana Şêx Seîd, Xoybûn û Dêrsimê ku qirkirin ferq kiribûn û pêş ketibûn, mixabin nekarîn herka dîrokê biguherînin. Ji ber ku ji bo têkoşîna azadiyê ya hevpar dereng mabûn. Lê belê mîrateyeke bêmînak ji peyrewên xwe re hiştin. Rêber Apo û hevalên wî ji vê pergala zilmê re gotin 'bisekine' û ji gelekî ku hebûna xwe ji bîr kiribû egîd afirandin. Ji ber vê yekê ye ku kurdayetiya ku ji xwe şerm dikir îro bû çavkaniya serfiraziyê. Rêber Apo, ji bo ku jinên kurd, ciwan û gelên din careke din neyên qirkirin, kaniya ronakbiriyê afirandin. Ji bo ku Kurdistana veguherandibûn goristana gelan dîsa bikin bihûşta gelan, bingeh ava kirin. Divê di serî de were zanîn ku heke me ciwan, jin, gel û hemû mirovahiyê nekarîbe rêberê serdemê ji pergala qirkirinê derxînin, ev ji bo me cihê şermê ye. Weke rêhevalên we yên li zindanê, ji bo ku em vê şermê bi dawî bikin û azadiya gelê xwe û rêberê xwe pêk bînin, ji bo piştevaniya bi têkoşîna hatiye destpêkirin me dest bi greva birçîbûnê kir.

Di vê çarçoveyê de banga me ji bo tevahiya gelê me ew e ku vê têkoşînê li her qadê mezin bikin, dengê me li herderê belav bikin û kolan û bajaran veguherînin qadên berxwedanê. Hêvî em in, hêz em in, zilm çiqas hovane dibe bila bibe efendiyên dil û ruhê xwe em in."





## Êriş nîşaneya serketina paradîgmaya şoreşê ye

**Idrîs Henan**

Di çarçoveya teslîmgirtina vîna gelê Kurd de, êrîşên koordînekirî bi ser herêmê ve tên. Aliyekî dorpêç, birçîkirin û bi zorê derbiderkirin, aliyekî jî bi balefir û tangan êrişkirin hene. Siyasetên hemwext ên dagirkerên Kurdistanê di dewrê de ne. Çendîn dijatiya wan mezin dibe jî, dev ji siyasetên dijminatiya ji daxwazên gelan re bernadin. Mesele; rejîma Şamê çiqas tengezar dibe jî, hewl nade têbigihêje ku ancax xilasî di itîfaqa bi gelan re be.
Beriya çend rojan daxuyaniyek rayedarên rejîma faşîst a Tirkiyê hebû ku digot; "em ê zêde li bendê nemînin ku herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi desteke Amerîka, bibe herêmek dijfirînê".
Paralelî bilindkirina gelê Kurd ji têkoşîna azadî û demokrasiyê re, faşîzma Tirk bi koordîneya bi dagirkerên beşên dîtir ên Kurdistanê re êrişî saziyên xizmetê, pîşesazî, aborî, tendirustî û civaka sivîl dike. Tabî ev êriş li ber çavên cîhanê rû didin. Ango; di çarçoveya lihevkirinek global de êriş hene. Ne wisa be, mirov çawa dikare bêdengiya heyî binirxîne? Wê çaxê cîhan jî ewlekariya civaka navdewletî bi awayekî gelek xirap û bê sinc, rûbirûyî gefeke mezin a berbelavbûna terorê dihêle û bi tiliyên xwe maska rûyê Erdogan û rejîma wî ya faşîst li hewa dihêle.
Erdoganê ku rondikên sûsmaran li ser Xezayê dibarîne, li ber rûyê her kesî, bê perwa, êrişî destketiyên gelan ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike.Diyare pêşketinên demokratîk ên rojane li Herêma Bakur û Rohilatê Sûriyê; ragihandina itîfaqa gelan a Hevpeymana Civakî, kombûna di Kongreya MSD de, serketina Kurdan li Kerkûkê, naskirina vîna Rêveberiya Xweser a Şengalê û serketina nûnerê wê di hilbijartinên Meclîsên xwecihî yên Îraqê de, çalakiyên şoreşgerî yên Gerîlayên Kurdistanê, berxwedana zîndanan û bibinketina ezbenî û kurtêlxwarên dagirkeriyê; terazûyeke hêzê ya tirsinak di dilê wî de daye avakirin. Civaka Tirkiyê baş pê hesiya ku ewqas sal in bi serdestiyeke bêbext, derewker, dizek û xapînok re jiyan dike. Raeksyona malbatên leşkerên li çiyayên Kurdistanê li ser destê Gerîlayên azadiyê hatine kuştin a li dijî kesayeta Erdogan baş wê têgihaştina civakî raber dike. Darbên giran ên li Xakurkê, Metîna û Zapê baş tivî dikin ku mirada faşîzma Tirk nehatiye cih. Bi gotinek din; diyar bû ku her tişta ji civakê re digot, derewên mezin ên bê kok in. Îcar hewl dide van binketin û têkçûnên xwe bi komkujiyan binixumîne. Ji xwe çi analîz û lêkolînên derveyî odeyên şerê taybet derketine, piştrast dikin ku artêşa Tirk di şerê xwe ya li hemberî vîna Gerîlayên azadiyê de bi bin ketiye. Ev jî rastiyek beloq li holê ye. Ne tenê ew; lê belê hemû ezbenî, kurtêlxwar û tevkarên wê jî bi bin ketine. Ji PDK'ê bigire û heya çeteyên li herêmên dagirkirî yên Bakur û rojhilatê Sûriyê were. Hemû jî bi bin ketine.
Dewleta faşîst a Tirkiyê vê rastiyê baş hîs dike û bi şêwazê êriş û gefan hewl dide binketina xwe ya dîrokî binixumîne. Lewre jî; êrişî binesaziya civakî dike û bi cîhana berjewendîperest re li hev dike. Dizane jî ku pozisyona xwe ya siyasî li dunyayê wenda kiriye. Yanê; weke rojên Sofyetan û bi bangeşeyên qaşo Duyemîn Artêşa NATO yê ye, êdî ew hemû badilhewa çûn û prestîja xwe li çiyayên Kurdistanê bi erdê ve dûz bûye. Hêzên xwedî berjewendî jî "Rûsya, DYE, Îran, Şam" ta ku îradeya gelan li Bakur û Rojilatê Sûriyê teslîm bigirin û projeya wan a pala xwe daye paradîgmaya Rêber APO ya Netewa Demokratîk, têk bibin, çavan li ser kiryar û sûcên faşîzmê dadimirînin. Berovajî wê yekê, faşîzmê li dijî vîna yekgirtî ya gelan gur û har dikin. Lew re; êrîşên hovane nayê wê manê ku dê ev şoreş bi bin keve, berjovajî wê yekê dide isbat kirin, ku ev şoreş êdî bi ser dikeve û li tevayî Sûriyê û Cîhanê tovên wê hişîn dibin.